

XWE

JI BAVÊ XWE VEDIZÎ

TERKA GUND Ê MALA XWE DA

DA KO HÎNÎ XWENDIN Ê NIVÎSANDINA ZIMANÊ XWE BIBE

Ne çîrok, ne dîrok, ne jî efsane ye. Eyn rstî û heqîqet, biserhatiya xortekî Kurd, xortekî kurd î hêja ye. Belê, ji bona ko bikare hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibe, xwe ji bavê xwe vedizî, bavê xwe xapand, ji gundê xwe rabû û çû Amûdê.

Xwendevanino! Guh bidine min, honê bibînî ko di van gotinan de tu mubalexe, tu zêdekirin nîne û ev xwerû rastî, rastiyeke rût û tazî û dijwar e.

Ma dinya ne remezan e, ez bi derengî çû bûm çapxanê. Li çapxanê, ji zilamên adetî û heroyî pêve xortekî xerîb jî hebû. Xort li ser kursîkî çapxanê î lingsikestî û hesîrdiryayî rûniştî bû, ji ber min ve rabû. Min silav li xelkê xwe û li wî kir û min cihê wî ji nû ve şanî wî da. Xortê xerîb rûnişt. Di çavên wî de pêt û çirûskên jîriyê diçirîsîn, di her hal û lebtên wî de ew edeb û terbiya kurdmancî a zikmakî dihate dîtin. Min jê re got:

-Xortê qenc min tu nas ne kirî, tu ji kû yî?

- Ezbenî ez ji dora Dirbêsiyê, ji gundê Tilêlûnê me.

Min hinekî din pê re xeber da, min dît ko zarê wî ne zarê beriyê ye, dîsan min got ê:

-Tu dibêjî ko tu ji Telêlûnê yî, lê zarê te ne zarê beriyê ye.

-Ezbenî xebera te ye, esilê me ji Wartoyê ye ji gundê Qerekan, em bi xwe cibrî ne. Navê min Cengbazê Cibrî ye, kurê şêx Mehmûd. Ev bûne

deh sal em ji welêt hatine. Gava em ji welêt derketine ez neh salî bûm. Bavê min seyda ye, di gundê Telêlûnê de dersa feqehan dibêje.

Min dîsan ji xortê xwe pirsî:

-Tu zanî bi kurdmancî bixwînî?

-Ma çawan nizanî ezbenî. Hergav Hawar ji min re têt. Lê hetanî ko ez hînî xwendina zimanê xwe bûm min gelek zehmet dît.

-Ma çire? ji elfabeya me hêsantir kêmfabeya peyda dibin.

-Zehmet ne di elfabê de bû.

-Lê di çi de?

-Ezbenî tu dixwazî ezê çîroka xwe ji te re bibêjim.

-Ma çawa naxwazim, kerem bike bibêje.

-Ezbenî beriya niho ji gava Hawar derketi bû ez pê hesiya bûm. Lê hingê ez piçûk bûm û min nikarî bû ez ji xwe re tevdîrekê bibînim û hînî xwendina zimanê xwe bibim. Xwedê fikira miliyetê, ji berê de di min de çêkiriye. Lê min zehf dixwest yên ko bi vê meselê dixebitin û pê hesiyane ez bi wan re hevaltiyê bikim û feydekê ji wan bibînim. Lê belê ba me li gund yên ko bi navê kurdîtiyê têne ban kirin û bi xwendina kurdiyê dizanin nînin. Hawar jî ji nû ve derketi bû. Min she kir ko li Amûdê hin ji vî qismî hene. Ba me adet e feqeh di gundên xwe de dest bi xwendina ilmê erebî bikin ji paşê diçin gund û bajarine din. Ji ber ko dibêjin heger feqeh ji mala xwe bi dûr ket û çû xerîbiyê **D.R.(7)**